

R'EWŞA SÛRÎYAYÊ PIŞTÎ TÊKÇÛNA R'ÊJÎMA BAASÎ, PIRSGIRÊKA K'URDÎ Û R'ÊYÊN Ç'ARESERÎYA WÊ!

Ê ku hatye cîhanê, ji bo ku li r'û
erdê r'a bixîşike, nikare bifir'e!

Mak'sîm Gorkî

Ezîz ê Cewo

Di gotara xwe ya berî vê da¹ piştî êk'skûrsek a biç'ûk a dîrokî min li ser vê pêvajoya dîrokî, ya ku di Sûrîyayê û, bi giştî, di herêma R'ojhilata Navîn da destpêkê bûye, li ser r'ola gelê me û helwestê û t'evger'yanên hinek sazî, r'êxistin û kesayetiyên me – k'urdan di vê dema dîrokî da r'êzk nirxandin pêk anîbûn. Evan nirxandinana bala xwendevanan k'işandibûn, û gelek hem ew xwendibûn, hem jî p'arvekiribûn, hinekan heya nêr'în û p'eyamên xwe r'ê kiribûn. Spas ji bo hemû r'êzdarên!

Wek ku tê bîra xwendevanê hêja, min hema di sernivîsa wê gotarê da dîtina xwe di derbarê vê pêvajoyê da dyar kiribû, ew jî ev bû: ew, ku r'êjîma baasî ya Sûrîyayê k'et, ne dawî bû, lê– destpêk a nû!

Lê naha, berî ku derbazî hinek nirxandinan bibim, min dixest balê bik'işînim ser t'erefê r'êgezî yê têngîna "k'etina r'êjîmê". Ew, ku r'êjîma baasî ya Sûrîyayê têk çû, ne t'enê û ne ewqasî encama êrîş û fişarên hêzên ç'ekdar ên k'omên el-qaydayî² yên ji derva hatî bû, çiqasî ji ber r'izîbûna r'êjîmê ya ji hindur' va û ner'azîbûna gel û k'arbidestên dewletê bi xwe, û di encamê da ev k'omên ç'ekdar hatin û li ser k'ilafe û k'elaxê r'êjîma her'ifi r'ûniştin...

Lê, her çiqas van k'oman, ên ku li ser vê p'êlê di qesra serokk'omarîyê da p'eyda bûn, parlamêto, hemû sazî û dezgehên berê, art'êş û hêzên ewlek'arîyê, partîya BAAS û heya r'êxistina xwe – ya Heyet T'ehrîr eş-Şam (HTŞ)³ jî betal kirin, û erk'ên serokk'omarîyê û wezîran di nava xwe da p'arvekirin, lê, yek e, bi van hemûyan jî pirsgerêkên vî welatî ç'areser nebûn. Berovajî vê, mirov dikare bibêje. r'ê li pêşîya pirsgerêk û aloziyên nû hate vekirin. Û dest bi pêvajoyeke nû bûye...Lewra jî pirsên di derbarê pêşer'oya vî welatî da ji bersîvan zêdetir in.

Û di r'ewşeke weha ya aloz û ne dîyar da ya balk'êş jî ew bû, ku Ahmed Şaraa, yê ku bi xwe ji bo serokk'omarîyê xwe erk'dar kiribû (çiqasî ew wek erk'ek a demî hatibe daxwîyandin jî, ...!), berî ku hewl bide, ku pirsgerêkên Sûrîyayê yên hindur'în ç'areser bike (ew pirsgerêk jî, ewqas p'ir' in, ku li ser serê wan r'a avîtine!) berê xwe dide Erebistana Siûdî û T'irkîyayê... Ji bo çî, çîma?

Ew, ku di serî da çûye Erebistana Siûdî, ew jî bo wê bûye, ku baldarîyê ji armancên xwe yên bingehîn bibuhîrîne, an jî bo ku girêdana xwe ya bi r'êjîma T'irkîyayê r'a veşêre? – Mirov nikaribe tiştekî yekawa bibêje, Lêbelê, herdu sedem jî bi hev r'a li holê ne!

Baş tê zanîn, ku T'irkîya bi xwe, bi vê r'ewşa xwe ya îroyîn va, bûye dewletek a daîşî, Erdoxan bi xwe jî di nava daîşîyan da wek emîr ê DAÎŞê yê ne formal tê zanîn, ewî jî fermanîdar û ç'ekdarên daîşî di T'irkîyayê da art'êşek a alternatîv a aert'êşa dewletê saz kirye

¹R'êjîma baasî ya Sûrîyayê k'et – ev dawî bû, an – destpêk a nû?! –https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_ÊJÎMA_BAASÎ_YA_SÛRÎYAYÊ_K_ET_EV_DAWÎ_BÛ_AN_DESTPÊK_A_NÛ

² *El-qā'idah* ji hêla gelek dewletên cîhanê va wek r'êxistinek a têr'êrîstîya navnet'ewî hatye naskirin.

³ Ev r'êxistina berfanbara 2017-an li ser p'êla şer'ê navxweyî yê Sûrîyayê li ser bingeha k'omên îslama r'adîkal ên dijberî r'êjîmê yên wek: *Cebhat Fat'h eş-Şam (Cebhat en-Nûsraya demekê)*, *Cebhat Ensar ed-Din*, *Cêyş es-Sûna*, *Lîva el-Heq û Nûr ed-Dîn ez-Zenkî*, pêk hatibûye. Paşê bi giştî derdorê sîh k'omên cuda di nava vê r'êxistina da hebûne.

– art’êşa xwe! Jixwe têk’ilîyên Erdoxan ên bi vê r’êxistina t’errorist r’a baş tèn zanîn. Ewqasî, mirov tê nagihîje, ev dewletên hevkar û hevparên vê r’êjîma faşîst çima ç’avên xwe li ser vê r’astîyê digirin. Ew ditirsîn, li xwe mukur’ bèn, ku ew bûne hevkarên r’êjîma daîşî, an berjewendîyên wan jî di vê r’ewşê da hene?!

Her çiqas, di welatên cîhanê yên cuda da di derbarê r’astîya T’irkîyayê da bi dehan belgefilm hatine weşandin, û mirov dikaribû ew hemû di cîyekî da berev bikirana (lewra ku di wana da delîlên konkrêt ên pêbawer hene) û ew wek dosyayekê amade bikira – bi sernavê, em bibêjin, “Erdoxan û DAÎŞ” ... Yek ji wan jî sala 2015-an di R’ûsîyayê da hatye weşandin.⁴

Lê, heya eger ev hemû nînbûna jî, her ew doz (Doza Kobanîyê)⁵, a ku r’êjîma Erdoxan/Baxçelî li dijî çalakvan û siyasetmederên k’urd vekirine, ji ber ku wana piştgirîya berxwedana Kobanîyê ya li dijî DAÎŞ-ê kirine, wek delîla here berbiç’av û girîng, t’êrê dike, ku Erdoxan û hevalbendên wî yên daîşî di dadgehek a navnet’ewî da darizînin!

Û hema bersîva pirsê: “Ev Colanîyê duh, Eş-Şaraayê îro, çima berî ku hewl bide, ku pirsgirêkên welatê “xwe” ç’areser bike, dir’eve bal Erdoxanê emîrê DAÎŞê?” di gotineke pêşîyên me da heye: “Her ç’ivîkek a esmanan xwe li r’efê xwe digire!”

Û li vira jî pirsê a dinê dertê holê: “Her çiqas ewî bi şewazî HTŞ betal jî kirye, gelo ew û ç’ekdarên dinê yên îslama r’adîkal ên duh (û ew jî endamên derdorê 30 k’omên cuda!), çiqasî jî benstû (kravat) avîtibin spûyê xwe, cilên ewropîyan wergirtibin, dê bikaribin, gelo, xwe ji r’astîya xwe ya pêkhatinî bişon, û mejû û têgihîştina xwe ya cîhanê biguhêr’in?” – Bersîva vê pirsê jî em ji xwendevanên hêja r’a bihêlin!

Lê, eger mirov van pirsan dayne hêlekê jî, pirsê dinê ya girîng a r’êgezî li ber me seknye: “Evên ku xwe wek serok’omar, wezîr û nîznîm – çi û çi, erk’dar kirine û r’agîhandine, k’îjan kongrê (an meclîs) a gel ew hilbijartine û erk’ dane wan, û anegorî kîjan qanûnê yan destûrê? Ji van erk’darên dewletê yên îro-ç’ekdarên demekê yên îslama r’adîkal çend mirov hemwelatîyên Sûrîyayê ne? Ew nûnertîya k’îjan Sûrîyayê dikin, û ji navê k’îjan Sûrîyayê diçin hevdiîtan? Ev hevdiîtan û erk’adarkirina wan bi xwe çiqasî r’ew ne? Ma Amêrika (DYA) û Ewropa (YE) evê nak’okîya berbiç’av (kazûs) tê nagihîjin, an dizanin, lê bi zanebûn r’ê li pêşîya wan vedikin, ku ew heya dawîyê lîstikên xwe yên îslama r’adîkal bilîzin, hemû k’artên xwe vekin, û her paşê ?”

Pirs in, pirs in, pirs!

Bila ew lîstikên xwe bidomînin, lê, k’a, em derbazî pirsên dinê bibin, ên ku di r’êzê da hene.

Pirsê dinê di wê derbarê da ye, k’a helwest a me– k’urdan, wek net’ew, di vê r’ewşê da divê çi û çawa be?

Bala xwe bidinê!

Evan k’omên ç’ekdar ên îslama r’adîkal (ên *el-qaydayî!*) hatine, ji xwe r’a di Şamê da cîh bûne, hemû sazî, r’êxistin û dezgehên dewletê betal kirine û, bêyî ku guh bidin daxwez û hêvîyên gel, bi wî bişewirin, wî beşdarî girtina bir’yarên xwe bikin, r’abûne, xwe r’êvebirîya welêt a nû r’agîhandine û bi wî awahî desthilata xwe li gel ferz dikin. Ê, em bibêjin, gel hê di bin bandora k’elecana têkçûna r’êjîma baasî da ye û zêde di ferqa van nak’okîyan da nîne, gelek di demên cuda da welatê xwe t’erikandine, lê wê demê bê, ewê li ser xwe da bèn, bûyerên pêkhatî û encamên wan wat’edar bikin. Û wê demê dê dest bi p’elek a nû ya nak’okî û alozîyan bibe...

Ma ne, dema van k’omên ç’ekdar, her yek ji wana ji xwe r’a k’etibûne herêmên cuda û, k’ê çawa dikaribûye, xwe îdare kiribûye, ev êdî zêdetirî deh salan e, li Bakûr-R’ojhilatê Sûrîyayê (R’ojava) herêmek a xweser heye, bi beşdarbûna nûnerên hemû pêkhatîyên herême

⁴ <https://yadi.sk/i/AaqRLXyjA 29grg> – Her çendî ev film bi r’ûsî ye, lê derfet’ên ku îro di întêrnêta da hene, dikarin bi hêsane pirsgirêkên wergerê bert’erf bikin.

⁵ Di vê derbarê da hûn dikarin bi hûrbînî li vir bixwînin: “Cîhana sewdaser – doza Kobanîyê” – <https://amidakurd.net/ku/tekst/ CÎHANA SEWDASER>

r'êvebirîyek a xweser hatye avakirin, sazî û dezgehên dewletek a bi r'êk û pêk hatine damezirandin, bi misogeriya mafên hemû pêkhatîyan, beşên civakê yên cuda û zayendan va. Û di r'ewşeke weha da, evên ku xwe r'êvebirîya Sûriyayê r'agihandine, bêyî ku bingehe û cêr'ibandinek a xwe ya r'êvebirîyê hebin, ç'avê xwe li ber van destk'evtîyan digirin, wek ku ji bilî wan di vî welatî da tişteke nîne! Ew bi vê helwesta xwe dixwazin çî bibêjin? – Bi r'astî, ev tişteki dûrî têgihîştina mirov a normal e!

Û ya dinê, eger ev mirovana xwe r'êvebirîya vî welatî dihejmêrin, r'êjîma faşîst a T'irkîyayê bê navber êrîşan tîne ser Herêma xweser a Bakûr-R'ojhilatê Sûriyayê û t'evkujîya gelê medenî pêk tîne, çima dengê ji vê “r'êvebirîyê” dernayê? Berovajî vê, nûnerên van k'omên ç'ekdar ên ku hatine di Şamê da cîh bûne (ji ber netîştokî û nedestûrmendîya Beşar Esed û r'êjîma wî!) û dînhêr'in, k'a ew t'evkujî û wêranî çawa pêk tên. Û ev jî ne bes e, bêyî ku nûnerên Herêma xweser vexwendînin, ku bi hev r'a ji bo ç'areserkirina pîrsgirêkên heyî r'êyekê bibînin, bi xwe di nava xwe da li hev dicivin, xwe wek r'êvebirîya vî welatî r'adigihînin, di nava hev da erk' û p'eywiran p'arvedikin, û demildest berê xwe didin Er-R'iyadê û Ankarayê.

Ma mirov evê çawa têbigihîje, ev tê çî wat'eyê? Ev nayê wê wat'eyê, ku li vira armancên van k'omên el-kaydayî û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê yek in, ku herdu jî naxawazin hiç mafekî pêkhatîyên Sûriyayê nas bikin, ku ew diçin bal sponsor û emîrên xwe, ji bo ku bi hev r'a êrîşên hev'ar ên li hember Herêma xweser koordîne bikin? ...

Eger – na, mirov evê çawa dikare şirove bike?!

Evana bi van bir'yarên xwe berê R'êvebirîya Herêma Xweser didin k'u?

Û li vira pîrsek a dinê jî r'û dide – di r'ewşek a weha da R'êvebirîya Herêma Xweser divê çawa t'evbiger'e? Gelo, dema evan k'omên çekdar ên îslama r'adîkal, ên ku di Sûriyayê da xwe gihandine desthilatê û bi nûnerîya DAÎŞ-ê (Erdoxan) r'a dik'evin nava hev'arîyê, r'êvebirîya Herêma Xweser dê bikaribe bi wan r'a zimên bibîne, an, r'asttir dibû, mirov bigota – gelo hêja ye, ku tişteki mirov ê hev'ar bi wan r'a hebe? Bi vî awahî, gelo, hemû destk'evtîyên gelê R'ojava û Bakûr-R'ojhilatê Sûriyayê dê nek'evin nava xeterîyê?

Di vê r'ewşê da du r'ê li pêşîya Herêma Xweser hene – an serxwebûna xwe r'agihîne – û ev k'omên îslama r'adîkal r'êyekê dinê ji bo wê nehîştine – an jî bi awayekî r'ewşa statûs-k'vo a heyî bip'arêze, heya gelê Sûriyayê r'êya xwe dibîne? – Helbet, mirov nikare, yekawa tişteki bibe je – li vira her hêvîyek heye, ku r'êvebirîya siyasî ya Herêma Xweser dê anegorî r'ewşê bir'yarên r'ast û pêwîst bigire! Em bi bawer in, ku ev r'êvebirî, ya ku Herêm ji êrîşên hovane yên DAÎŞ-ê p'arastye, bi beşdarîya nûnerên hemû pêkhatîyan di nava van deh salên dawîyê da bi şarazayî bingeheke bi r'êk û pêk a r'êvebirîya welatekî danîye, dê di vê r'ewşê da jî r'êyên ç'areserîyê bibîne...

Û di vê r'ewşê da tê r'agihandin, ku ENKS-ê ji bo xweerk'darkirina Colanî ya ji bo serokk'omarîyê, ji wî r'a p'eyama pîrozkirinê şandye. – De, îjar were, û ...!

Mirov dikare, ji vê r'a çî bibêje?!

Li şûna vê baş dibû ku wan ç'avê xwe li ser r'astîya van k'omên ç'ekdar ên îslama r'adîkal vekirana. P'ir'anîya endamên wan k'omên ç'ekdar ne sûriyayî ne, di nava wan da ûygûrên ji Çînastanê (Çîn), afxanî, nûnerên gelên Asîa Navîn, ên Bakûrê Kafkasîyayê, ên gelên R'ojhilata Navîn û her weha ji gelên dinê hene. Û evana îro dixwazin ç'arenûsa gelê Sûriyayê hildin destê xwe!

Îjar ev jî ne bese, ev biraderana, yên ku hinekan ew wek “encûman” “erk'dar kirine”, r'adigihînin, ku ew xwe ji ît'ilafê vedik'işîne!

Mirov dixwaze ji van biraderan bipirse: “Ît'ilafa çî? Ma haya we bayê cîhanê nîne? Ma ne, ew bi xwe îro bûne desthilatdar, û hûn derî her leystokên xwe hiştine, ew we heya hêjayî silaveke biç'ûk jî nabînin. Mirov ewqasî jî xwe biç'ûk naêxe!

Ma ewqasî jî nabe!

Hûn hê jî tê negihîştine, ku di dema xwe da kek Mesûd bi r'êjîma Baxçelî/Erdoxan r'a t'evayî hûn li ser k'axazokan “afirandine”, ji bo ku planên xwe bînin sêrî. Planên wan pêk hatin (?), naha hûn wek amûrên xilmetbûyî û bêkêr êdî kêrî wan nayên, lewra jî li

navberê mane! Hinekî ç'avên xwe vekin, hinek tiştan bibînin, ma ne, di nava we da mirovên p'ir' hêja û zane jî hene!? Binihêr'in heya HTŞ-ê jî xwe xwe wek rêxistin betal (fehs) kirye! Di herêma we da ji bo we û nivşên we yên dihatûyê bingehê hatye avakirin, êdî li wira şaristanîyek a nû digihêje, her'in, beşdarî wî k'arê pîroz bibin, wek k'urd, ne wek r'êxistneke bi daxweza MITa t'irkan û Zanîyariya PDK bi dest hinartî!..."

Hêvîyek a mezin heye, ku di vê r'ewşê da r'êvebirîya sîyasî ya Herêma Xweser dê di vê r'ewşê da bir'yarên ç'êker bigire û hemû beşên civakê wergire nava vê pêvajoyê. Û mînakên weha jî, êdî hene!

Û li ser vê notê em carake dinê vege'rin ser pîrsa Yekîtîya Net'ewî.

Bala xwe bidinê! Piştî di çapemenîyê û medya civakî da helwestên cuda di derbarê hev'arîya PDK-ê û rêvebirîya Herêma Otonom a Başûrê K'urdistanê û sazî û r'êxistinên p'abendî wan ên bi AKP û r'êjîma faşîst a T'irkîyayê r'a derk'etin holê, kek Mesûd nûnerê xwe yê t'aybet şand R'ojava – bal gênêral Mazlûm Kobanî û ew vexwend Hewlêrê. Hevdîtina wan di Hewlêrê da pêk hat... Pişt'r'a ewî r'êvebirîya ENKS-ê anî bal xwe, qaşo şîret li wan kir, û li ser vê bingehê heya astekê heya r'êklama wî jî hat kirin... Hemma, di helwest û t'evgeriyana kek Mesûd û sazîyên derdorên wî da guhar'tinek pêk nehat, berovajî vê... Serleşkerê pêşmergeyan û wezîrê pdkî yê hukumeta Herêma Otonom a Başûrê K'urdistanê vekirî bi devê propaganda dijk'urdî a r'êjîma faşîst a T'irkîyayê li dijî T'evgera Net'ewî ya R'izgarîxaz axivîn, û r'êjîmê jî ji vê helwesta wan wêrekî girt û êrîşên xwe yên ser bendava T'işrinê û p'ira Qereqozaqê û gundewarên R'ojava bi t'undî domandin...

Îro li hember gelê herêmê t'evkujî didome, lê dengê ji Mesûd Barzanî û sazî û r'êxistinên bi wan va girêdayî dernek'et... Ma, di vê r'ewşê da ewî biraderî nikaribû hinek hewlên nevbeynk'arîyê pêk banyana? Ma ne, di navbera wî û r'êjîma Erdoxan/Baxçelî da t'êk'iliyên hevpeymanî yên r'ojane hene... Balk'êş e, ewî newêribû, an nikaribû hema pîrseke hrêtorîk jî bîne zimên?

Dibe ku hinek bibêjin, ma ew çî dikare bike?

Çima nikare? Ma ew dikare ewqas (ji 40-î zêdetir!) baregehên leşkerî û sîxurî yên r'êjîma T'irkîyayê di Herêma Otonom a Başûrê K'urdistanê da cîh bike, pêşmergeyên xwe bike xizmeta leşkerên dagerker, nikare hema bangeke nîvdeng li wan bike, ku ew t'evkujîya gelê medenî r'awestînin? K'urdîtiyê jî daynin hêlekê, ma êdî mirovatî û mirovbûn li k'u man?

Wek ku li jorê jî hatibû gotin, piştî gotara min a navborî⁶ hinek xwendevanan helwest, nêr'in û dîtînen xwe şandibûn, dibe, paşê mirov bikariba wana bi awayekî binirxîne, lê naha ezê li vira p'arç'eyekî ji nameya xwendevanekî me yê ji Qazaxistanê – Bek'ir Mamêdov bînin: "... Ez bi xwe zêde bi siyasetê va mijûl nebûme. – di nameya r'êzdar Bek'ir da tê gotin. – Bavê min ê bihuştî (ew sê sal ber çû ber dilovanîya Xwedê) dema Sovêtê t'evgerên k'urdan dişopand, van salên dawîyê ew p'ir' diêşîya, ku di nava gelê me da yekîtîyek nîne. Bi xwe xwendina wî bilind nînbû, lê ewî wek siyasetmederekî şareza li pîrsan dinihêr'î û ew dinirxandin... Berî mirina xwe ewî r'ojekê ji min r'a got: "Sed heyf, lawo, kalê Barzanî di dema xwe da kê-m-zêde t'êk'oşînek meşand, lê ev zar'okên wî k'etin xefika dijminan... Ewî derxist, hev'eyvînek ji ber întêrnête girtî da min, got bixwîne, binihêr'e vana em gîhandin çî r'ewşê... Ez jêderka (lînk) wê ji we r'a dişênim, bixwînin, dibe ku hûn bersîvên gelek pîrsan di wê da hebin û tê bigihîjin, k'a mirov di vê r'ewşê da dikare çî bike..."(Name bi xwe bi r'ûsî bû – werger a min e. – E. C.)

Ez di întêrnête da li wê nivîsê ger'yam û min ew dît. Ew hev'eyvîna yek ji ajansên here bi bandor a R'ûsîyayê ya "Regnum"-ê bû – ya bi êdîtorê sereke yê portala "Kurdistan.ru" Yûrî Nabîyêv r'a, ya ku 29-ê berfanbara 2013 bi sernivîsa "Îslamîkirina t'evgera k'urdî li hember "îslama nerm" a Gulen-Erdoxan" hatibûye weşandin.⁷ Û piştî du

⁶ Li nasiya 1-em binihêr'in!

⁷ <https://regnum.ru/article/1618551>

r'ojan (31. 01. 2013) heman hevpeyvîn ji hêla malp'erek a dinê ya R'ûsiyayê ya "Nirxandinên Leşkerî" («Военное обозрение») va jî tê weşandin.⁸

Berî ku ez p'arçeyekî biç'ûk ji vê hevpeyvînê bînin, bibêjim, k'a girîngiya vê hevpeyvînê di çî da ye. Ji bo ku pirs r'ast bê têgihîştin, di sêrî da divê bê zanîn, ku, wek prînsîp, hevpeyvînek a weha (ew wek manîfêstoya Mala Barzanî-PDK-ê ye!) bêyî ku ji hêla malbetê va bihata erêkirin, nikaribû pêk bihata, lewra ku portala "Kurdistan.ru" ya wana ye, û Yûrî Nabîyêv jî wê demê êdîtorê wê yê sereke bûye. Heya, wek ku demên weha da pêk tê, dîsa, wek prînsîp, divê ajansa "Regnum"-ê pirsên xwe ji wan r'a şandibin û bersîvên wan jî anegorî dîtina PDK-ê, an jî, heya ji hêla wan va hatibin amadekirin û şandin. Ji ber wê jî gelek pirsên siyaseta PDK-ê, têk'îliyên mala Barzanî bi r'êjîma faşîst a Erdoxa/ Baxçelî r'a dê baştir bê têgihîştin, eger ev hevpeyvîn ji hêla pisporan va bi t'evahîya xwe va bê nirxandin...

Lê naha em bînin ser wî p'arçeyê biç'ûk ê vê hevpeyvînê, yê ku wek lêytmotîva wê dertê pêş xwendevanan: "... *Wek ku min êdî gotye, – Yûrî Nabîyêv dibêje – serokê K'urdistanê Mesûd Barzanî ji binemala şêxên t'erîqeta nexşbendîyan e. Û yek ji mirîdên t'erîqeta Nexşbendîyan jî R'eceb Erdoxan e. Dema seredana xwe ya Hewlêrê ya vê dawîyê Erdoxan wek mirîdekî berbir'î şêxê xwe bibe, danûstandinên xwe bi Mesûd Barzanî r'a pêk anîn...*"⁹

Û li vira jî pirsêke dinê r'û dide: "*Ma şêxê nexşbendîyan (ew k'urd be, an – na, zêde ne girîng e!) hîç gotinekê nabîne, ku ji mirîdê xwe yê qat'îlê gelê medenî r'a bibêje?*" – Bersîva vê jî em ji xwendevanên hêja r'a bihêlin û derbazî pirsê serê hemû pirsan bibin. Ew pirsê mafên gelê k'urd, azadîya R'êberê Net'ewî r'êzdar Abdullah Ocalan û wê dewletê ye, ya ku wek "K'omara T'irkîyayê" tê navkirin.

Ji bo ku em bikaribin, evê pirsê ne ku anegorî wê têgihîştinê binirxînim, a ku dewletên mezin ên cîhanê di dema xwe da têgînên "t'irk" û "dewleta t'irk" li me û cîhanê ferz kirine, k'a, em bi hev r'a berê xwe bidin dîrokê.

Di sêrî da divê bibêjin, ku hîç tiştekî min jî li dijî hîç gelekî nîne. Ez di wê bawerîyê da me, ku di cîhanê da gelên xur'û qenc, an xirab nînin, di nava her net'ewekê da jî mirovên cuda yên qenc û xirab hene. Û ne qencî, ne jî xirabîya wan, têkiêîya xwe bi nasnameya wan a êt'îkî r'a nîne – ewqasî, bi xwezayî, mirovên qenc û xirab hene. Hew!

Lewra jî em di sêrî ji bo xwe pirsêkê zelal bikin – k'a, ji dema sêlcûkîyan girtî heya Împêratorîya Osmanîyan t'irk k'î bûne, an k'î wek t'irk hatine dîtîn, wan deman ji k'ê r'a "t'irk" hatye gotin û îro jî ew t'irk k'î ne û li k'u ne?

Eger yek derê û bibêje – ez amade me, bersîva van pirsan bidim, fermo, bila derê pêş û ji cîhanê r'a bibêje, k'a...

Ev pirsê wan dîrokanan e, yên ku bi ciddî bi dîroka T'irkîyayê û ya t'irkan va mijûl dibin, ne yên ku bi dîroka vir' û derewan a bi ferza dewletê hatye nivîsîn va! Fermo, bila ew bi erdnîgarî, bi çandî, bi xwetêgihîştina net'ewî û bi jîyana r'ojane t'irkan, wek qewm, destnîşan bikin!

Naha em bînin ser têgîna "K'omara T'irkîyayê", ya ku di nava me – k'urdan da wek dewleta t'irk tê navkirin.

Ma, yê ku wê demê (destpêka salên bîstî ya sedsala bîstî) bi planên dewletên cîhanê yên gewre ev projeya bi navê "K'omara T'irkîyayê" pêk anî û başê jî bû "bavê t'irkan" (At'at'ûrk), t'irk bûye? Ên bi wî r'a bi vî k'arî r'abûne, gelo, ji wan k'îjan çiqasî t'irk bûye, û t'irkbûna wan di çî da bûye? K'î dikare bibêje, k'a ji K'emal P'aşa (At'at'ûrk) girtî heya bê-derê evê dawîyê – Erdoxan, çendek ji wana t'irk bûne? K'î dikare bibêje, k'a ew maldar û binemalên xwedî hebûn û dewlet ên yewnanî-r'omî (vîzansî) piştî t'êkçûna Împêratorîya Vîzansa gewre k'uda çûn? Ma ew nebûn hulm û çûn esmanan? – Ew di cîyekî da jî neçûne!

⁸ <https://topwar.ru/23626-islamizaciya-kurds-kogo-dvizheniya-protiv-myagkogo-islama-gyulena-erdogana-intervyu-yuriya-nabieva.html>

⁹ Li nasîyên 5-em û 6-em binihêr'in!

Hemû sazî dezgehên dewleta sêlcûkî-osmanîyan ji wan pêk hatine û ew dewlet li ser milê wan ava bûye. Çi nav jî li van dewletên li ser k'îlafeyên Vîzansê avabûyî nekirine, yek e, gelê k'urd ji wan r'a R'om gotye (dapîr û bapîrên me jî ew wek R'oma r'eş zanibûne!)...

Balk'eş e, hinek dibêjin, ku Dewlet Baxçelîyê serokê parîya faşîst (MHP) bi eslê xwe ermenî ye, hinek heya dibêjin, ku ew k'urd e, ku Meral Akşenera seroka partîyeke dinê a nijadp'orest (*İyi Parti*) yewnanî ye... Dibêjin Ozel k'urd bûye... Ev her ew in, ên ku di derbarê wan da tê gotin! Lê serokk'omarê (û nijadp'orestê) T'irkîyaya îroyîn gurcekî misilman e, serokê sîxurîya dewletê (MIT) ya demekê – Hakan Fîdan k'urd e, yê ku îro wezîrê k'arên derva yê T'irkîyayê ye... K'î dikare bîne bîra xwe, an aghîyeke dîrokî bîne, k'a di dîroka vê dewleta xwîn'r'êj û xwînmij da ji bilî vî wezîrekî dinê yê k'arên derva jî hebûye, yê ku weke vî Hakanî dijminê her tiştê k'urdî bûye... Îjar em dibêjin – t'irk, dewleta t'irk, faşîstên t'irk, eskerê t'irk... Belê, belê, navê van hemûyan îro t'irk e, ew bi paseport t'irk in, lê çi t'êk'îlîya wan bi net'ewekê r'a heye, ya ku her bi nav heye, di xwezayê da nîne?!... Îro nasnameya evê konglomêratê (bi zimanê gelêrî – girara qereçîyan!) bi destûra bingehîn a vê dewleta bi dest (sûnî) hinartî t'irk e (xala 66-an)!

De, îjar were û ji hev vebijêre – k'a t'irk-net'ierk k'î ne!!!

Di nava zanista dîrokê da t'êgîna “dewletên bê nasnameya êt'nîkî” heye. Gelo K'omara T'irkîyayê jî yek ji wan e? Eger wisa be, wê demê t'emenê wê zêde nemaye, dewletên wisa, jiyana wan kurt e...

...

Van demên dawîyê di întêrnêta da hevp'eyvîma r'oernameger û şrovegerê siyasî yê navdar Mehmed Elî Bîrand hatbû belavkirin. Di wê hevp'eyvîna xwe da ew dibêje, ku ew k'urdekî bişavtî (asîmîlebûyî) ye!¹⁰ Ahmed Davûtoxlû, yê ku demên cuda wezîrê k'arên derva û serokwezîrê K'omara T'irkîyayê bûye di hevp'eyvînek a xwe da dibêje, ku ew bi eslê xwe va ji t'ukmenên k'oç'er e û li T'orosan hatye cîhanê.¹¹ Lê ew li wir wisa jî behsa bi nasnameyî t'irkbûna xwe dike. Li bal mirovekî normal dê li vira pîrsek r'û bide: “Çawa dibe? Naha ew t'urkmen e, yan t'irk e?” – A, hema k'îlîta r'avekirina t'êgîna “t'irk” di vir da veşartî ye – ango, tu bi net'ewa xwe va k'î jî hebî, ger tû hemwelatîyê vê dewleta zulmê yî, tu t'irk î! Ê ev ji bo Davûtoxû û yên wek wî tiştêkî normal e, ji ber ku ew wek kesayetî berhemên vê sîstêmê ne!...

Helbet, evana her du mînak bûn, ên ku min anîn. Lê çiqas mînakên weha hene? Dibe ku yên ku di K'omara T'irkîyayê da hatine cîhanê, li wir mezin bûne, li wir çûne dibistanê û zanîngehan, bikaribin bi dehhezaran, heya bi sedhezaran mînakên weha bînin...

Li vira mabesta min ne serjimara t'irk-net'irkan e. Na!

Li vira pîrs di tiştêkî dinê da ye. Eger di T'irkîyayê da ji bilî gelên dinê yên cuda wisa jî net'ewek a bi navê t'irk hebûya, t'eqaz dê ji nava wan hinek mirov derk'etana, yên ku xwedî wijdan, exlaq û r'ûmeta net'ewî ne. Ê dê r'êvebirîya xwe neç'ar bikirana, ku ji navê wan li hember gelên dinê bêdadî, hovîti û sîcên dijmirovî pêk neynin, ku mafên gelên bîndest r'a r'êz bigirin.

Ji dîrokê tê zanîn, ku dema Şer'ê Cîhanê yê Duyem di Almanîyayê da faşîzm desthilat ku xwe t'irk nas dikin, li vir û wir hebn jî, yên ku wek netew pêk nehattine)!

Dibe hinek bipîrsin: “Lê ev hemû çawa pêk hatye?” – Li vira pîrs di wê da ye, ku di bin navê t'irkîyayê da çiqas mirovên bêexlaq, bêwijdan û bêr'ûmet ên ji qewmên dinê hebûne û îro jî hene xwe li wê nasnameyê girtine (û ev jî îro pêk nehatye, ew pêvajoyeke demdirêj a sedê salan bûye!), ji bo statûsa xwe ya heyî bip'arêzin, li dijî her hewleke ji bo ç'areserîya

¹⁰ Mehmet Ali Bîrand: Ben asimile olmuş bir Kürdüm –<https://www.youtube.com/watch?v=LYNJcIdpA4>

¹¹ Hevpeyvîn-Ahmet Davutoglu: Min Alaya Kurdistanê li Enqereyê bilind kir- <https://www.rudaw.net/kurmanci/interview/171120242>

pirsgirêkên net'ewî berxwedanekê pêk tînin, lewra ku ewana dizanin, eger mafên k'urdan bê naskirin, gelekên dinê jî, yên wek Mehmed Elî Bîrand, Davûtoxlû û yên dinê dê derên holê û gelên ç'avtirsyayî dê serî bilind bikin, û evên xwefroş û netîştok dê di navberê da r'ût û tazî bimînin, xelkê li wan bik'ene, û dê li r'û erdê ji bo wan cîh nemîne, an jî ewê wek mirovên bêr'umat û nuxsan xwe ji civakê veşêrin. A, ya ku ewqas bi bir'yar li dijî ç'areserîya pirsgirêka k'urd dertê, civaka van bêeslan e, ne ya t'irkan e, ya ku, gelo, heye-t'uneye û li k'u ye, hê kesek nizane...

Naha li ser vê notê em gihîştin pirsekê ya ku bi xwe r'a r'êzek pirsên dinê jî anîn.

Ew pirs bang Dewlet Baxçelî ya, qaşo, ji bo ç'areserîya pirsgirêka k'urd e!

Helbet ev jî bi serê xwe pirsek e – çima r'êjîmê ev erk'a hema da Dewlet Baxçelî – serokê T'evgera nijadp'eresî û hevparê Erdoxan ê r'êjîma faşîst di T'irkîyayê da?!

Li ser asta konspîrologîyê di vê derbarê da li vir û wir hinek şiroveyên cuda pêk hatine, lê r'êvebirîya T'evgera R'izgarîxwaz (K'CK) ji bo hemû pirsan bersîv û şiroveyên zelal dane.

Naha ez dixwazim balê bik'îşînim ser piseke r'êgezi: “Gelo ev daxwîyanîya ku ji hêla nûnerên r'êvebirîya r'êjîma faşîst va hatye dayîn, mabesta wan destpêka pêvajoya aştyê bûye?”

Eger mirov bi heşmendî pirsê binirxîne, ne ku bi hestyarî, bersîv yek e – na!

Lê ev çi bû?

Wek ku tê xuyan, di nava sazî û dezgehên navdewletî da li ser pirsê ç'areserîya pirsgirêka k'urdî, azadîya R'êber Ocalan hinek goftûga pêk hatine, û hinekan, şewir dane r'êvebirîya T'irkîyayê, ku dem pêr'a gihîştîye, vê pirsê bi r'êyên aştyane ç'areser bikin.

Ji bo ku pisgirêka k'urdî bi r'êyên aştyane bê ç'areserîkirin, R'êberê Net'ewî r'êzdar Ocalan ne ku t'enê r'êyên praktîkî pêşniyar kirine, her weha, di vî warî da ne carekê û ne jî dudyan gav avîtine. Ewî wisa jî, wek bîrewarekî serdemê yê bêhemp'a, di berhemên xwe da jî bi zanistî r'ê û r'êbazên ç'areserîyê r'avekirine û dane pêş. Û ew berhemên wî jî di cîhanê da bi dehan zîmanan hatine weşandin. Û li şûna guh bidin bang û hewlên wî, ev êdî 26 sal e, ew wek girtîyê azadîyê li girava Îmralîyê di hebsê da, wek r'ehîneyê bêdadîya navdewletî dimîne ...

Û r'êjîmê ev erk' bi zanebûn sparte Dewlet Baxçelî, û bi devê wî bang ç'ekberdanê li PKK-ê kir, lewra ku wan hêvî dikir, heya, dibe ku, ew bi bawer bûn jî, ku k'urdê wê pêşniyarê r'ed bikin, û ewê jî ji patronên xwe yê derva r'a bibêjin – a, we dît, em êdî çi dikarin bikin?

Lêbelê, ew di hesabên xwe da şaş derk'etin!

R'êvebirîya T'evgera Net'ewî dizanibû, k'a yên ku li hemberî wan sekinîne, k'î ne!

Û hevdîtînen şanda DEM Partîyê bi R'êberê gelê k'urd r'a pêk hatin, r'êzdar Ocalan dîtina xwe ya di derbarê ç'areserîya pirsgirêkê da anî zimên û da zanîn, ku ew amade ye, û ew hêza wî hêye, ku pêvajoya aştyê bibe sêrî...

Van r'ojên dawîyê wisa jî hate gotin, ku R'êber Ocalan dê p'eyamek a vîdêoyî bişîne – û ew dikare 15-sibatê, yan piştî wê pêk be! Û hemû bi hêvîyek a mezin ç'av li r'ê ne, k'a R'êberê Net'ewî dê çi bibêje.

Di vê navberê da gelê k'urd û T'evgera R'izgarîxwaz, sazî û r'êxistinên cuda jî k'arên xwe yên ji bo azadîya r'êberê xwe û pêvajoya aştyê didomînin. Di welatên cuda da hevdîtînen, konferans û civînên cuda pêk tên. Di bajarên K'urdistanê û T'irkîyayê da meş û mîtingên piştgirîya pêvajoya aştyê pêk tên – gel li ser p'êyan e... Û hewlên r'êjîmê, yên ku ji bo têkbirina pêvajoyê hatibûn dayîn, T'evgerê werguhêrî pêvajoya r'astî kir!

Û lewra jî r'êjîma Tirkîyayê bêhtir har bûye û ji hêlekê va êrîşên xwe yên li ser Herêma Xweser a Bakûr-Rojhilatê Sûrîyayê bi barbarî didomîne, ji hêla dinê va dest dide ser şaredarîyên Bakûrê K'urdistanê û gotinên xwe yên xilmetbûyî dubare dike, ku divê PKK, HPG, YPG û HSD dest ji ç'ekan berdin!

Mirov ku van bangan dibihê, bêyê r'ayê wî pirsek tê ber heşê wî – gelo ev mirovên van bangan dikin, ser heşê xwe ne, an hatine zombîkirin? Qey bibêjî, ew ji dû eyneya xar a

ç'îrokî va ji sedsalên navîn derbazî serdema me bûne!

Bapîrên me ji bo yên wek van gotine – evan dû k'êşa karwanan mane. Cîhan pêş va diçe, ya van, hê di nava xewnên sêlcûkîyan û osmanîyan da bawîşk tèn wan!

Ma, gelo ew bi xwe ji wan gotinên xwe bawer dikin? Hebûna vê r'êjîma hov û barbar bi xwe hildana ç'ekan li k'urdan ferz kirye û îrojî ferz dike, heya eger t'evger û r'êxistinên k'urdan û ç'ekên wan nînbûna jî, ewana dê ji bo p'arastina xwe ya fizîkî û nirxên net'ewî t'evger û r'êxistin ava bikirana, dê ç'ek hildana û dijî zulm û zordarîya van barbaran derk'etana pêş!

Lê îro T'evgera Net'wî ji her demê bêhtir bi hêz û berfirehtir bûye, dost û dilxwazên we di cîhanê da zêde bûne, û, eger ev r'êjîm vê nebîne, dê bi xwe têk her'e!...

Û ya sereke, her çiqas r'êjîma faşîst a T'irkîyayê k'arên xwe yên r'eş li hember R'ojava didomîne jî, herr'oj Bendava T'işrînê û P'ira Qreqozaxê û gund û bajarên herêmê dide ber t'opearanan, li hember gelê sivil t'evkujîyê pêk tîne, yek e, gel r'anewaste, qelfe bi qelfe k'omên nû diher'ikin-diçin, bi bedena xwe bendava xwe dip'arêzin...

R'ast hatye gotin – gelê ku nexwaze bimire, hîç kesek nikare wî bikuje! – Hemma, heyf, ku yên wek Erdoxan û Baxçelî evê r'astîyê tê nagihîjin!

Emê hîvîyê bin, heya banga R'êberê Net'ewî digihîje gel. Gelê me bi bawer e, ku r'êberê wî dê r'ewşê binirxîne û ji bo vê serdemê û r'ewşa heyî r'êyên ç'areserîyê destnîşan bike... Piştî wê dê dyar bibe, k'a gelê me û sazî û r'êxistinên net'ewî divê di vê r'ewşê da çawa t'evbigerin...

Li şûna paşgotinê:

Neh mehan pey bi korsanî girtina r'êberê gelê k'urd bir'êz Abdullah Ocalan r'a min gotar-nirxandinek bi sernivîsa "Pisgirêka k'urdî. ...Cîhanê ji bo ç'areserkirina wê çi r'êyan pêşnîyar bike?" nivîsî (28. 11. 1999). Ew di R'ûssîyayê da di bin sergotara giştî ya "R'abin, dadgeh tê!" da bi zimanê r'ûsî hate weşandin, şewazên wê yên cuda di konfêrans û sîmpozîûmên navnet'ewî da hatine pêşk'êşkirin (dîsa bi r'ûsî)... Peyr'a, hê dereng, ew hate wergerandin û bi zimanê k'urdî jî di malp'erên k'urdî yên cuda da hate weşandin...

Wê demê min di vê gotara xwe da ev wêneyê Dadgeha navnet'ewî ya Nyûrnbergê jî, bi van gotinên jêrê weşandibû.



Dadgeha navnetewî ya Nyûrnbergê (1945 – 1949). Ji bo pêkanîna sûcên giran li hember mirovahîyê syasetmeder, serleşker û serekfermandarên Almanya faşîst hatin darizandin. Lê kengê, gelo, ev dadgehê careke dinê berev bibe û ji bo sûcên giran, ên ku wan li dijî mirovahîyê pêk anîne, rêvebirên Tirkîyayê jî bèn darizandin?

... Ji wê demê û virva êdî 25 sal bihurîne, lê ew pirs hê jî di heş û sewda, r'ewan û r'amanên min da bê navber dubare dibin: “Dê kengê, gelo, dadgeha Nyûrnbergê careke dinê berv bibe, ji bo ku r'êvebirên T'irkîyayê, ji bo sûcên wan li hember mirovahîyê pêk anîne, darizîne?”

Û di dawîya gotarê da ji bo ç'areserîya pirsgerêka k'urdî jî, ji navê t'erefê k'urdî yê dozswaz min ev xalana pêşiyar kiribûn:

Ya yekem: dewletên gewre, eger ew bi r'astî dixwazin, ku pirsgerêka k'urdî bi aştî bê ç'areserkerin, divê dest ji siyaseta dustandartîyê berdin û li hember K'T' wan hemû sepanîn (sanction) û çalakîyan bi k'ar bînin, ên ku li hember Yûgoslavyayê – dema krîza Kosovoyê û li hember Îraqê – dema êrîşk'arîya wê ya li ser K'uvêytê (“Bahoz di xîzgehê da”) hatine k'aranîn.... Bi hemû hêz û derfet'an divê r'êvebirîya T'irkîyayê neç'ar bikin, ku guhartinan di wî beşê Destûra Bingehîn a wêlêt da pêk bîne, li k'u tê gotin, ku hemû niştecihên K'T' t'irk in, û li şûna wê binivîsin, ku “gelên bingehîn ên K'T' t'irk û k'urd in, û anegorî wê jî maf û erk'ên wan diyar dibin. Ku ew k'omar ji du welatên ji hêla maf va weke hev – T'irkîyayê û K'urdistanê pêk tê”. Mafên nûnerên gelên dinê jî divê bi Destûra Bingehîn a K'T' bêne misogerkerin.

Ya duyem: civaka navnet'ewî divê girtina Abdullah Ocalan wek çalakîya cerdevanîya (eşkiyalik) dewletan a navnet'ewî qîmet bike, wê t'ewanbar bike û daxwez bike, ku r'êberê net'ewî yê gelê k'urd di bin garantîya R'existina Nat'ewên Yekbûyî (RNY), Yekîtiya Ewropayê (YE) û r'existinên dinê yên navnet'ewî û dewletên gewre da bê azadkerin. Dewleta t'irk divê wisa jî hemû girtiyên siyasî azad bike û zîyanên wan ên wat'eyî û darayî li wan vege'îne.

Ya sêyem: ji bo ku qîmetekî t'am bidin wan barbarî û t'evkujîyan, ên ku r'êjîma t'irk a berê û naha li hember gelên k'urd, ermenî, yewnanî, asorî û yên dinê pêk anîne, trîbûnala navnet'ewî saz bikin û pirsê wan r'êvebirên zulmk'ar ên T'irkîya duh û îro, wek pirsê sûck'arên leşkerî bibihên, ên ku li dijî mirovahîyê sûcê giran pêk anîne.

Ya çarem: leşkerên dagerker ên K'T' ji xaka Bakûr û Başûrê K'urdistanê bîn derxistin.

Ya pencem: ji hesabê byûcêya T'irkîyayê û byûcêyên wan dewletan, yên ku piştgirî dane zûlmk'arîyên wê, yanê jî ç'ek danê û îro jî didin wê, û bi wan ç'ekan t'evkujî û wêranî ji K'urdistanê r'a anîne, zyanên wat'eyî û darayî yên k'urdistanîyan li wan vege'înin: gund, bajar û r'êyên r'ûxandî ji nûva ava bikin, merc û derfetan amade bikin, ji bo ku k'urdên ku bi neç'arî bûne p'enaber, vege'înin cîh û warên xwe (bêyî wê, k'a ew p'enaberî çiqas dem berê pêk hatye, û di bin garantî û ewlehîya rê'xistinên navnet'ewî da).

Bi vê r'a dê ji bo dewletên gewre derfet çêbibin, ku ew beşdarî avakirina gund û bajarên K'urdistanê yên wêrankirî bibin û aborîya wê ya t'alankirî r'akin ser p'êyan.

Ya şeşem: bingehê p'ir'alî amade bikin, ku bi qanûneke t'aybet derfetan ji bo wan k'urdan biafrînin, ên ku di encama siyaseta dewleta T'irkîyayê ya nep'ejirandin û bêt'ehmûliyê, binp'êkirina mafan û t'evkujîyê da neç'ar mane, welatê xwe bit'erikînin û, ev êdî çend nivşên wana di welatên bîyanî da dijîn, vege'înin welatê kal û bavan, ji bo ku T'irkîya hemû zyanên wan ên wat'eyî û darayî li wan vege'îne û, wisa jî, xercê vege'îna wan a wêlêt û bi cîh û warkirina wan ji byûcêya dewletê bide.

Û, ji bilî wê, di dawîyê da gotinek jî ji bo Mala Nûneran (Meclîs) û gelê DYA heye: “Hukumeta DYA hersal navnîşa (liste) r'existinên têt'orîst amade dike, û di r'êza wan r'existinan da wisa jî navê PKK datîne. Mirov dixwaze ji amadek'arên vê navnîşê bipirse: “Ey dadgerên bir'êz ên qencî û xirabîya vê cîhanê, gelo we li ser çi bingehê ew navnîş amadekirye? Hema helwesteke weha ya li hember têt'orîzmê bi xwe r'ê li ber têt'orîzma r'astîn – têt'orîzma dewletê – veneke, gelo?” Ew, ên ku xwe mirovên dadmendî dihejmêrin, ên ku navê wan ê Mirov bi tîpa mezin nivîsî ye, bila destê xwe bidin ser dil û wijdanê xwe an li ser P'irtûka pîroz û bibêjin, k'a ewana, wek mirov, ne wek erk'darekî, yê ku di bin desthilata qanûnên dijmirovî da ye, dê bi çi awahî li dijî hovên devbixwîn ên heya diranan

biç'ekkirî bitêk'oşyana, yê ku ajotine welatê wan, malwêranîyê û miriînê ji kes û kinêzên wan r'a tînin?

Gelo r'êyeke dinê dimîne, dema mirov hîç bi awayekî dinê nikare wî hovê dirinde yê di dilqê mirov da r'awestîne? Ma ne di dîroka hemû gelên cîhanê da demajoyên weha hebûne, û ewan gelana li dijî dagerkerên bîyanî têk'oşîna xwe ya mafdar meşandine. Ê ev mafê gelan di tûzika R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (RNY) da misogerkirî ye!¹²

¹² Ev gotar bi t'evahîya xwe va di p'irtûka xudanê vê gotarê ya “Abdullah Ocalan. Ramana azadîyê, gelê kurd û cîhan” da hatye weşandin, r'ûp'el: 20 – 30.–https://amidakurd.net/ku/tekst/ABDULLAH_OCALAN_Ramana_azadîyê_gelê_kurd_û_cîhan